

KURDOLOJÎ LI QAZAXISTANÊ Û ASYA NAVÎN

HEJARÊ ŞAMIL

Dî serdema Împaratoriya Rûsyayê de naven-da zanistiya Kurdolojiyê Saint Petersburg bû û her wiha di sedsalên 19an de li Tbilisê (Tiflîs) paytexta Gurcistanê jî di vê hêlê de karên giring dihatin meşandin. Piştî damezirandina Yekîtiya Sovyetê, St.Petersburgê rola xwe ya serdest parast. Di heman demê de li bajarên Moskova, Erîvan, Tbilisî û Bakûyê xebatên Kurdolojiyê pêş ket.

Her weha bi terciha Moskovayê bajarê Erîvanê bi piranî ji sedemên siyasî, wek navenda edebiyat, çand, perwerde û rojnamegeriya Kurdî hat hilbijartin. Lêbelê, di salên destpêkê yê Yekîtiya Sovyetê de, bajarê Tbilisê ku bi kevneşopî wekî navenda Qefqasyayê bû, ji bo vî karî guncavtir hatibû dîtin. Paşê, bi ya min sê sedemên sereke hişt ku Erîvan wekî naven-

da wêjevanî, rojnamegerî, çand û hunera Kurdî bête hilbijartin:

Beriya her tiştî, di destpêka sedsala 20an de, nifûsa herî mezin a kurdîaxêv, li Ermenistanê bû: 15 hezar 262 kes (serjimariya 1926). Di heman salê de 6 hezar 487 Kurd li Gurcistanê hatibû qeydkirin. Di nav 41 hezar 193 Kurdên ku li Azerbaycanê hatine tomarkirin de, hejmara kesên Kurdîzan gelek kêmbû.

Sedema duyem jî ew bû ku Ermenî û Kurdên li Ermenistanê dijîn, ji zilma Tirkan gelek êş kişandibûn û 'birayên qedere' bûn. Di vî warî de Ermenistan zemîneke zexmtir bû ji bo pêşxistina çanda Kurdan.

Sedema sêyemîn. Di destpêka salên 1920î de, serokê Gurcistanê Lavrentiya Beriya siyaseta Gurckirina Tbilisê dişopand. Di demeke kin de Ermeniyên ku li Tbilisê pi-

raniya wan bûn, kir hindikahî. Di vî bajarî de 'navenda Kurdan' avakirin, dijî stratejiya Beriya bû.

XEBATÊN KURDOLOJIYÊ LI QAZAXISTANÊ Û ASYA NAVÎN PIŞTÎ HILWEŞÎNA YEKÎTIYA SOVYETÊ DEST PÊ KIRIN

Kurd di sala 1937an de ji Azerbaycan û Ermenistanê, di sala 1944an de jî ji Gurcistanê sirgûnî Qazaxistan, Qirgizistan û Ozbekistanê hatin kirin.

Di serdema Şah Abbas (1571-1629) de bi deh hezaran Kurdên ku îro li Tirkmenistanê dijîn koçberî vî welatî bûne û di serdema Nadir Şah (1688-1747) de jî ev pevajo berdewam kiriye. Ew xizmên Kurdên Xorasanê ne. Kurdên li vî welatî dijîn rastî asîmilyoneke topyekûn hatine.



LI QAZAXISTANÊ XEBATÊN KURDOLOJİYÊ

Di serdema Yekîtiya Sovyetê de li Qazaxistanê û dewletên Asyaya Navîn hin xebatên çandî yên wekî avakirina komên folklor û muzîkê hebûn jî, lê xebatên Kurdolojiyê qet nehatin kirin.

Xebatên Kurdolojiyê li Qazaxistanê û Asyaya Navîn piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê dest pê kirin. Lê, kurdologên Sovyetê di dema Sovyetê de li ser Kurdên li van welatan dijîn hin berhem danîne holê. Pirtûka ‘Devoka Kurdên Turkmenistanê’ (Moskova, 1962, Çerkez Bakayev, 1912-1998) ya herî girîng ji van e. Olga Ivanovna Jigalina (1946-2013) di monografiya xwe ya bi navê “Mîrîtiyên Kurd yên Xora-

Kurdên Qazaxistanê

sanê di dema Gacarên dawî de” û di hin gotarên xwe de behsa Kurdên Turkmenistanê kiriye. Di dema Sovyetê de di medyaya navendî û herêmî de li ser Kurdên Qazaxistanê û Asyaya Navîn hin nivîsên înfomatîk dikeve ber çavan, lê lêkolîneke sistematîk nehatiye kirin.

Rojnameya *Sibê* ya demkurt ku di navbera salên 1982 û 1984an de li Qazaxistanê bi Rûsî û Kurdî derketiye, mînaka yekem a çapemeniya Kurdî ya li welatên Asyaya Navîn e.

Di 19ê Îlona 1991ê de li Qazaxistanê rojnameya “Kurdistan” wek organa rêxistina “Yekbûn”ê bi zimanên Rûsî û Kurdî dest bi weşanê dike. Xebatkarên pêşî yên rojnemeyê Rostam Broyî, Mehmedê



Kurdên
Kazakistanê

Misto, Mamed Yusubov, Mustafa Yusuf, Firûdîn Osmanov û Aylaze Hemîd in. Rojnameyê ji sala 1993'an ve weke weşana Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê weşana xwe didomîne. Navê rojnameyê du cara tê guhertin. Piştî "Kurdistan" bi navê "Kurde Zana" derdikeve û di sala 2004'an de navê wê dibe "Jiyana Kurd". Sernivîserê yekem yê rojnameyê (1991-1993) Rostem Brovî ye. Paşê Kinyaz Mîrzoyêv (1993-1994), Mehmedê Misto (1994-1997), Hesenê Hecîsilêman (1998-2015), Hesenê Evdo Aliyev (2015-2022) û Casimê Cefer Osmanov (2022) karê sernivîsertiyê dikin. Rojnameyê car caran navber daye weşana xwe lê, bi gelemperî mehê carekê tê weşandin.

Îro rojnameya "Jiyana Kurd" bi zimanên Kurdî, Rûsî û Qazaxî derdikeve, bi giranî di rûpelên xwe de

cih dide mijarên civakî û çandî yên girêdayî Kurdên Qazaxistanê û mijarên girîng ên Kurdistanê.


Kovara "Nûbar" ya civakî, çandî û wêjeyî, di sala 1992'an de li bajarê Almatî yê Qazaxistanê bi zimanên Kurdî, Rûsî û Qazaxî bi navê "Kurd" dest bi weşanê kiriye. Sernivîser Kinyaz Mîrzoyêv, xebatkarên pêşîn Eskerê Boyîk, Salihê Heso Seyadî, Hesenê Evdo û Hesenê Hecîsilêman bûn. Kovarê di navbera salên 2009 û 2021'an de dema ku Kinyaz Mîrzoyev sernivîser û Hejare Şamil edîtor bû, serdema xwe ya herî berhemdar derbas kir.

Kovara "Nûbar" tenê bi Qazaxistanê re sînordar nemaye, bi berdewamî mijarên çandî û wêjeyî yên Kurdên Yekîtiya Sovyetê ya berê û Kurdistanê ronî kiriye.

Malpera bi navê 'Berbang-nur.com' ku di nîveka salên 2010'an de weke organa medyayê ya Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê hate damezrandin, ji bo hînbûna jiyana civakî ya Kurdên li vî welatî, çavkaniyeke girîng e.

Di destpêka salên 1990î de hatina yek ji endamên dibistana Kurdolojiyê ya Ermenistanê prof. Knyaz Mîrzoyevî (1947-2021) li Qazaxistanê, bû sedem ku xebatên kurdolojiyê li wir bi awayekî sistematîk bînin kirin.

Li Qazaxistanê gotar û pirtûkên wek "Sirûda netewî ya gelê Kurd" (1991), "Têkiliyên edebî yên Kurd û Gurcî" (1992), "Rêya geşbûna têkiliyên edebî yên Kurd û Azerî" (1993), "Têkiliyên navbera wêjeyan û varisî" (1996), "Çarenûsa dîroka wêjeya Kurd" (1998), "Kurd, Ansîklopediya piçûk" (2001), "Edebiyata



Kurdî / Edebiyata gelên Qazaxistanê” (2004), û hwd. ya Kinyaz Mîrzojevî têne weşandin. Yek ji xizmet û xebatên herî girîng ên K. Mîrzojev li ser ziman û perwerdeyê ye: “Zimanê Kurdî”. Pirtûka dersê ji bo polên 2-9 (2006), “Bernameya mêtodîk a zimanê Kurdî (Ji bo mamosteyên komên 2-9)” (2006). “Alfabe ya Kurdî” (2020), “Zimane Kurdî (Zaravaye Kurmancî)” (2021).

Pirtûkên Prof. Nadir Nadirov (1932-2021) “Em Kurdên Qazaxistanê” (2003) û “Cûdahiya demê an vegeerên dîrokî: testa duristiyê” (2008), ku bi Rûsî hatine çapkirin, ji bo hînbûna paşxaneya dîrokî û pêvajoyên pêşketina Kurdên Qazaxistanê çavkaniyên girîng in. Her du pirtûk ronahiyê didin ser dîrok, jiyana civakî û siyasî ya Kurdên Qazaxistanê û Yekîtiya Sovyeta berê.

Kurdên Kirgizistanê.

Yekemîn pirtûka ku jiyana dîrokî, civakî û çandî ya Kurdên Qazaxistanê û Asyaya Navîn dinirxîne, pirtûka Prof. Azîzê Zîyo Bedirxan (1953) ya bi navê “Kurdên Qazaxistanê” (1995) ye.

Pirtûkên Azîze Zîyo yê bi navê “Kurdîstana Sor” (2009) û “Mele Mistefa Barzanî - Mirovê Efsaneyî” (2013) di warê Kurdolojiyê de xwedî naverokeke zanistî ya girîng in.

“Xwarinên neteweyî yê Kurdî” (1999), pirtûka doktor Halîme Amo Nadirova (1941) mînaka yekem e ku li Yekîtiya Sovyeta berê çanda xwarinên Kurdî dide naskirin.

Pirtûka Prof. Mehmedê Misto Mamedov (1956) ya bi navê “Kurdên YDS: rewşa niha û meyla pêş-

keftinê” ku di sala 2000î de bi Rûsî hatiye çapkirin, di lîsteya lêkolînên kurdolojiyê yê Asyaya Navîn de cihê xwe girtiye.

Pirtûka Rûsî “Derbarê erdnîgariya Kurdistanê û Kurdan” (2009) ya Tîmûr Sadîkovîç Ahmedov (1936) hewleke baş e ku welatê Kurdistanê bi xwendevanên Rûsîaxêv bide nasîn.

Pirtûka Rûsî ya Hesênê Hecîsileman (1951-2015) “Rêya Jiyane” (2009), ku behsa jiyana û têkoşîna serokê rêxistina Kurdên Sovyetê “Yekbûn”ê Mehmedê Siloyê Babayev dike, di warê fêrbûna serdema 1937-1991 de çavkaniyeke girîng e.

Berhema Gulnara Ahmedova ya bi navê ‘Elfabe ya Zimanê Kurdî’ (2023) di warê hînkirina nivîsandin û xwendina bi Kurdî de destpêxeriyê baş e.



LI QIRGIZISTANÊ XEBATÊN KURDOLOJIYÊ

Xebatên Kurdolojiyê li Qirgizistanê dema ku Hejarê Şamil (1966) di sala 2005an de koçî vî welatî kir dest pê dike. Broşura K. Amirova ya bi navê 'Proza Kurdî (1936-1980)' ku di sala 1995'an de li paytext Bîşkekê bi Rûsî derketiye, îstisnayeke e.

Pirtûka Hejarê Şamilî "Kurdên Diyasporayê, lêkolîneke dîrokî û rojane li ser Kurdên Sovyetê" ku li Sembolê bi tirkî (2005) û li Bîşkekê bi rûsî (2007) hate weşandin, di tevahiya dîroka Kurdolojiya Sovyetê de yekemîn pirtûk e ku dîrok, jiyana civakî, çandî û rewşa siyasî ya hemû Kurdên Sovyetê bi panoramatîk û bi hûrgulî lêkolîn dike.

Xebatên wî yên giring "Kurdên Qirgizistanê" (2011), "Kevneşopî û nûjenî di çanda kurdên Qirgizistanê de" (teví S.M.Skripkina) (2011), "Kurd li Meclisa Gelên Qirgizistanê: Xurtkirina Toleransê" (teví S.M.Skripkina) (2016) bi encama însiyatîf, ked û hewldana Hejarê Şamil hatiye çapkirin.

Weşanxaneya "Zengezur" ku di sala 2006an de Hejarê Şamil li Qirgizistanê damezrand û bi tena serê xwe birêve bir, di dîroka Yekîtiya Sovyeta berê de yekemîn û tekane weşanxaneya Kurdî ye. Heta sala 2014an zêdetirî 20 pirtûkên Kurdî û Rûsî di weşanxaneyê de hatine çapkirin.

Di nav van pirtûkan de "Jiyana di rêya welatparêziye de. Jînenîgarî" (Hejarê Şamil, 2007), "Kurdistana Sor" (Azîzê Zîyo Bedrixan, 2009), "Rêya Jiyane" (Hesenê Hecisileman, 2009), "Dîroka Kurdistana Kafkasyayê" (Wakil Mustafayev, 2011), "Mele Mistefa Barzanî - Mirovê Efsaneyî" (Ezîzê Zîyo Bedrixan, 2013), "Rêbera Axafîtinê. Rûsî-Kurdî" (Kamîz Şeddadî, 2012) û hwd. ji girîngtirîn mînakên lêkolînên Kurdolojiyê ne li Asyaya Navîn.

Nêzikî sed gotar di malpera mi-diya.kg (2010-2013) de ku ji aliyê Hejarê Şamil ve hatiye birêvebirin, li ser dîrok û jiyana civakî ya Kurdên Qirgizistanê û her weha li ser mijarên Kurdolojî hatine weşandin. (Di sala 2013an de malper hatiye arşîvkirin û girtin).

Pirtûka lêkolînê ya Uğur Ad-sız bi navê "Kurdên Qirgizistanê" (2020, Stenbol) ji bo fêrbûna dîroka sirgûnê û jiyana civakî ya Kurdên li vî welatî dijîn, çavkaniyek baş e. Her wiha lêkolîner Uğur Ad-sız teza xwe ya masterê li ser Kurdên Qazaxistanê nivîsandîye.

KURDOLOJÎ LI WELATÊN DIN ËN ASYAYA NAVÎN

Li Ozbekistan, Tacikistan û Turkmenistanê xebatên Kurdolojiyê nehatine kirin.

Di çapameniya peryodîk a van welatan de û di hin pirtûkên li ser

Rojhilata Navîn de agahiyên giştî û naskirî yên li ser Kurdan cih girtiye.

Dîsa em dikarin behsa çend gotarên Baxşî Salih Ehmed (1922) ku bi eslê xwe ji Başûrê Kurdistanê ye, li ser Kurdistanê û Kurdan bikin. Ew li Enstîtuya Rojhilatê Ozbekistanê mamostetiya zimanê Erebi kiriye.

ENCAM

Li pey hilweşîna Yekîtiya Sovyetê û piştî ku Ermenistan serxwebûna xwe bi dest xist, li vî welatê ku wek navenda 'ronesansa kurdan' tê dîtin, xebatên kurdolojiyê hema hema rawestiyane. Sedema sereke ya vê rûxandinê, rawestandina piştgirîya dewleta Ermenistanê û koçkirina rewşenbîrên kurd ji vî welatî bû. Mirov dikare bibêje ku piştî nîveke salên 1990î di warê Kurdolojiyê de 'ronesans' derbasî Qazaxistanê û Qirgizistanê bû. Ji xeynî Kurdan, di van 20 salên dawî de hinek xwendekar û zanyarên Qazaxistanê li ser Kurdolojiyê tez û gotar nivîsandine. Ji vana ya herî berçav berhema Orjanova Uljan Kerimbekova ya bi navê 'Pêşveçûna civakî-çandî ya diyasporaya Kurd li Qazaxistanê' ye.

Li vir, divê ku karên edebî û zimanî yên ku bi xebatên Kurdolojiyê re paralel hatine kirin, bi bîr bînin. Di van salan de bi dehan pirtûkên edebî, dersxane, fêrbûna ziman û bernameyên metodîkî yên dibistanên Kurdî hatin weşandin. ✓